

Agahiyên li ser desteka dêûbavîtiyê

Desteka dêûbavîtiyê li Västmanland

Di jiyana zaroka xwe de tu weke dê, bav an jî ehlê nêzîk kesê herî girîng î, lewra derfeta ku tu bikaribî tesîreke baş li ser tenduristiya zarokê bikî mezin e. Gelek çarçûm mirov nizane bê çî bike û çawa bifikire û lewra baş e haya mirov jê hebe bê çî destek û alîkariyê mirov dikare bistîne.

Desteka dêûbavîtiyê şeweyekî dayîna alîkariyê ye da ku şîyana dêûbavîtiyê û tîkiliya navbera dêûbavan û zarokan xurt bike. Hebûna tîkiliyê baş a navbera zarok û dêûbavan şertên pêşketina zarokê heta ku zarok kamil dibe xweştir dîke.

Di malpera www.1177.se/vastmanland/foraldraskapsstod de agahiyên li ser desteka dêûbavîtiyê hene. Li wir tê nivîsandin bê mirov dikare çî alîkariyê wergire û bê li şaredariya tu bi xwe lê dimîni çî pêwendî hene. Di vê pelika tu dixwîni de jî tu dikarî derheqê aktorên heyî de agahiyên bi zîmanê xwe bibîni. Em li vir peyva dêûbav bi kar tînin û mebesta me bi vê hem dêûbavên bîyolojîk in, hem jî serperîştê zarokan an jî salmezînen din in ku berpirsên zarokan e.

Lênerîna tenduristiya dayik û zarokan

Mödra- och barnhälsovården

Lênerîna tenduristiya zarokan, tedawî û alîkariyê dide jinên ducanî. Ew herwiha bi riya grûpên dêûbavan, amadekariyên welidandinê û destekê dide dêûbavan. Li navendên lênerîna dayikan, MVC, an jî miayenexaneya pîrîkiyê piraniya çarçûm pîrîkên zarokan hene. Li wir tu dikarî herwiha destek û pêşniyazên derbarê adetên xwarinê û navgînen bergiriya ducanîbûnê bi dest bixî.

Li navenda lênerîna zarokan, BVC, ji wextê zarok jidayik dibe û heta dest bi sinifê pêşdibistanê dîke zaroka te tê miayenekirin û vaksînkirin. Tu wekî dêûbav dikarî destek û şîretên li ser tenduristî û pêşketinê wergirî. Ev miayenexane piraniya li navendên lênerînê yan jî navendên malbatan e, lê ew dikarin ziyareta mala te jî bikin. Serdana BVC bi dilxwazî ye û ji hemû dêûbavan re vekirîye. Ziyaretkirina BVC belaş e.

Lênerîna tenduristî nexweşiyê Hälso- och sjukvården

Lênerîna tenduristî û nexweşiyê bi gelek awayan desteka tedawiyê dide zarok û dêûbavan. Navenda lênerînê di lênerîna vekirî ya civakî de xwediyê fonksiyoneke berfireh e û ji bilî tedawiya praktîkî dikare ji bo siheta zaroka te şîret û destekê bide. Li tenduristiya zarok û ciwanan, tenduristiya BU, zarokên dibistanê û ciwanên heta 18 salî yê li Västmanland dikarin tedawiya derûnî ya sivik wergirin. Mianexaneyên tenduristiya BU li sê cihên wîlayetê, li Västerås, Köping û Fagersta hene. Ji bo ku bikaribe serî li tenduristiya BU bide nîşanên pîrsgirêkên derûnî bi zarok an jî ciwanan re hebin.

Eger piştî tîkiliya bi Tenduristiya Xwendekar re yan jî Navenda Lênerînê re hîn jî dijwariyên zarokê li jiyana rojane, xwendegehê yan jî bi hevalan re hebin mirov dikare serî li Piskiyatriya Ciwan û Zarokan, BUPê bide. BUP lédikole, tedawî dîke û alîkariyê dide zarok û ciwanên bin 18 salî re, yê ku tenduristiya wan a pîskolojîk cidî ye, wek nimûne xemokî, tîrs, endîşe û dijwariyên ku li hember kesên din nikaribe hestên xwe. Eger ji bo cara pêşî tu serî li BUP didî pêwendiyê bi 'BUP Start' re deyne. Ew miayeneya destpêkî ya tevahiya wîlayetê ye û li Västerås e.

Piskiyatriya zarok û ciwanan, tedawiya zarok û ciwanan û klînikên zarokan gava nexweşiyêke zarokê yan jî astengdariyek hebe destekê dide dêûbavan. Tedawiya berdewamî, habilitasyon ji bo kesên astengdar e. Di vê rewşê de ehlên nêzîk jî dikarin destek û agahiyan wergirin.

Pêşdibistana vekirî **Öppen förskola**

Pêşdibistana vekirî ji bo dêûbav û berpirsên wan zarokan e ku li pêşdibistana normal qeyda wan tune ye. Li vir îmkan hene zarok bilîzin, di atmosfereke teşwîqkar de zarokên din bibînin û di heman demê de dêûbav bi hev re tecrûbeyên li ser zarokan parve bikin. Pedagogên pêşdibistana vekirî jî dikarin bersiva pirsên li ser zarokan û rola dê yan bavîtiyê bidin.

Xebatên pêşdibistana vekirî piranî belaş in û li gor şaredariyan dikarin cudahî hebin. Beşdar ne pêwîst e xwe qeyd bikin, kengî xwestin hingî dikarin serdana wê bikin. Pêşdibistana vekirî ji bo dêûbavên biyanî jî dikare roleke ciyê civînê bibîne û mecalê bide ku mirov di civaka Swêd de pêwendîyan deyne.

Navenda malbatan **Familjecentral**

Mebest bi navenda malbatan hevkarîya navbera lênerîna tenduristiya dayikan, lênerîna tenduristiya zarokan, pêşdibistana vekirî û xizmeta civakî ye bo xebatên bergiriyê. Carinan girêdayî navenda malbatan hin destekên din ji bo dêûbavan hene . Pîrik, hemşîre, mamosteyên pêşdibistanê, sekreterên sosyâlê û carinan rêberên malbatan, rêberên dema vala, pisîkolog û doktor li wir kar dikin. Amanca hemû kesên li navenda malbatan kar dikin pêşdebirin û başkirina tenduristiya zarokê ye. Xebat berê xwe dide zarokan, dêûbavan û ji bo pêşdebirina tenduristiyê û piştgiriyê kar dike da di wext de dijawariyan ji holê rake.

Pêşdibistan û dibistana seretayî **Förskola och grundskola**

Pêşdibistan, dibistana seretayî û dibistana seretayî ya taybet ciyên girîng in ku di wan de zarok, dêûbavên wan û pedagog hevkarîyê dikin. Di salên pêşdibistanê de û salên destpêkê yê dibistanê de hevdîtînen ku tu rojane bi pedagogan re dikî -dema tu zarokê dibî û tînî- ji bo te weke dê yan bav alîkariyê girîng e. Ew herwiha mecaleke baş a dabeşkirina agahiyan û hevkarîya ji bo zarokê ye. Cîvînê dêûbavan, êvarên agahîdayînê û axavtînen pêşveçûnê hin mînak ji fersendên din in.

Tenduristiya xwendekaran **Elevhälsan**

Li tenduristiya xwendekaran a dibistanê ji bo başbûna zarokê mirov dikare ji dema pêşdibistanê heta lîseyê destek û alîkariyê wergire, xwe pêş bixe û fêrî tiştên nû bike. 'Tenduristiya Zarokan' derbarê dilxweşiya li dibistanê, adetên tendurist ên jiyanê , halê derûnî, pîrsgirêkên rabûnûrûniştinê û astengdariyê agahiyan dide. Bi mebesta destekdayînê hem bi zarok hem bi dêûbavan re diaxive. Li wir li zarokê tê nerîn û tê vaksînkirin. Hem zarok hem jî dêûbav dikarin ji sinifê pêşdibistanê heta bi lîseyê serdana tenduristiya xwendekaran bikin.

Xizmeta civakî **Socialtjänsten**

Carcaran dêûbav dikarin şiyana xwe kêm bibînin. Wek nimûne rewşa zarokên xwe li pêşdibistan/xwendegehê têr nebînin an jî zarok îşaretên pêşveçûneke xeter nîşan bidin. Hingî dêûbav dikarin pêwendiyê bi xizmeta civakî ya şaredariyê re deynin da ku destekê wergirin. Eger endîşeya te ji bo zarokê hebe, herçend ew ne zaroka te jî be tu dikarî li xizmeta civakî bigerî da ew alîkarî û destekê bidin.

Xizmeta civakî alîkariyê dide malbatê, malbatên têkildar û ehlan. Alîkarî piranî li gor nirxandina pêdiviyên e, yanî vekolînek tê kirin û li gor Qanûna Xizmeta Civakî piştgiyariya tê heqkirin tê dayin. Malbatên xwedî zarokên astengdar dikarin di çarçoveya Qanûna Alîkarî û Xizmetê, LSS de alîkariyê bixwazin. Dibe ku ji bo zarokê alîkariya mayîna demkurt, pêwendîdar û ji malê re alîkariya guhertina nobetê were standin. Malbatên ku zarokên wan ên astengdar hene dikarin serî li rêberiyê, desteka praktîkî ya malê bidin, li gelek şaredariyan ji vê re dibêjin desteka malê.

Desteka dêûbavîtiyê ser înternetê **Webbaserat föräldraskapsstöd**

Gelek malper hene ku agahî û pêşniyazên derbarê mijarên cuda yê ser lênerîn û pêşdebirina zarokan belav dikin. Du malperên wiha "1177 Vårdguiden" û "Gravid.se" ne ku agahiyên di wan de ji aliyê pisporan ve hatine piştrastkirin.

Civaka sivîl **Civilsamhället**

Rêxistinên civaka sivîl yê wekî komeleyên sporê, çandê, tenduristiya pisîkiyatî, rêxistina mafê zarokan BRIS, Parastina Zarokan, yekîtiyên xwendekaran, cemaet û dêran alîkariyê didin.

Gelek dêûbav pêwendîya bi hin civakên sivîl re hêsantir dibînin, wek mînak wergirtina alîkariyê li ciyên ku sektora giştî tune ye, yan jî babeteke ku mirov weke şexs nêzîktirî xwe dibîne.